

KÎ BÛ SEBEB?

(Kerîk ji romana “Rya pêşîê min”)

Ew çend sal bûn, wekî Kelo çûbû rehetê. Çend malê qebîla wan, ku Çilkanîêda diman, bi menîê başqe-başqe bar kiribûn, ji gund çûbûn. Tenê mala Emo mabû. Emo îdî mezin bûbû, Salih û Seydoê kurê xwe zewicandibûn, du bûk – Nazê û Zînê anîbûn. Helê îdî tenê nîbû, du bûk ber dêst bûn.

Kerem hela nezewicî bû. Xortekî bejnîbilind, navmilfire, porkurîşkî ç’evreş bû. Gelek qîzê gund, gava ç’evê wî diketin, xwe şaş dikirin, tevhev dibûn, nizanibûn çi bikin.

Gundda qîzeke qebîleke mayîn hebû, navê wê Fîlê bû. Ewe pî-beden bû, porê wê çûr bûn, enî kever bû. Ç’evê gele xortê gund Fîlê bûn, lê ewê poz kesekî nedikir, her tenê dûrva disekinî Kerem dinihêrî. Gele cara ewê û Kerem qestîka mene çêdikirin, wekî qe na bên ber hevra derbazbin. Qîz, xortê gund tex’mîn dikirin, wekî navbera Kerem û Fîlêda tişteke heye. Lê derheqa vê yekêda hela tişteke nedigotin, çimkî ew tevayî nedîtibûn.

Lê carekê çolêda Kerem û Fîlê rastî hev hatin. Kerem pêşya Fîlê birî, da seknandinê.

- Hetanî kengê emê dûrva hevdu bivînin? Tu zanî dilê min ketye te. Ez zanim tu jî himberî min hêçxem nînî. Usane yanê na?

Fîlê xwe kerkir, serê xwe berjêr kir, dengê xwe nekir.

- De tişteki bêje, - Kerem gotê.

Fîlê xwe hevekî kerkir, paşê ber xweda got:

- Ezê çi bêjim...

- De wekî tişteki navêjî, ka were em destmalê xwe hev biguhêrin.

(Wî çaxî nava kurdada edet bû gava qîza û xorta destmalê xwe hev diguhêrîn, wekî usane ew hizkirîê hevin).

Kerem destmala xwe derxist, dirêjî wê kir. Fîlê hevekî xwe xurdilî, pêra-pêra destmal ji destê Kerem hilneda.

- Dive tu naxwazî destmala min hildî? – Kerem jê pirsî.

Fîlê hêdî ber xweda gotê:

- Na, çira, dixwezim, - û destê xwe dirêj kir, destmala Kerem hilda.

- De nha jî tu destmala xwe bide min, - Kerem gotê û zûr bû lê nihêrî.

Fîlê serê xwe dha berjêr kir û hêdî ber xweda gotê:

- Destmala min ne cem mine.

- Derewa neke, destmala te wê ber pišta teye. Hergê naxwazî bidî – nede, - Kerem bi dilmayî gotê.

Fîlê tevîhev bû, soro-moro bû, paşê hêdî destê xwe bire ber pišta xwe, destmal derxist, dirêjî Kerem kir.

... Wî çaxî du qîzê gunde mayîn xwe veşartibûn û dûrva dîna xwe didane Kerem û Fîlê. Ç'evê wan herdu qîza jî ser Kerem hebû, lê Kerem guh nedida wan. Lema wan herdu qîza hatin û pêra-pêra gundda belakirin, wekî Kerem û Fîlê destmalê xwe hev guhêrîne û gele gilî-gotinê netê serda zêdekirin. Gundda derheqa vê yekêda gele hatye xebordanê. Lê ew xebordan neketye guhê neferê mala Emo. Malbavanê Fîlê jî pêhesyabûn û hîvîê bûn, wekî mala Emo wê zûtirekê bêne xazgînîê Fîlê. Lê deng-his ji mala Emo nedihat. Bavê Fîlê – Nado – derheqa vê yekê pêhesyabû. Çend cara nava gundda ber wîra xeber avîtibûn. Eva yeka gelekî Nado keder hatibû. Hêrs diket, lê nedixwest tiştêkî usa bike, wekî xebordaneke dha mezin pêşda bê. Dixwest hertişt bê qalmeqalm, gilî-gotinê zêde bê sêrî. Û hîvya mala Emo bû. Lê mala Emo dengê xwe nedikir.

Çend meh derbaz bûn. Zivistan bû. Berf ewqas ketibû, wekî ber derê mala mîna topika berev bûbû.

Wê rojê Nado dîsa çû nava gund û yekî gundî berzeq derheqa qîzêda te'nek lêda. Nado caba wî neda, vegerya malê, gazî qîzê kir, çend tep dane nava ç'eva. Jin kete ortê, ancax qîz ji dêst xilazkir. Nado cîê xweda rûnişt, hevekî bîna wî hate ber, fikirî, paşê qirarkir gazî mêrê qebîla xweke û wan bişêwire. Usa jî kir. (Gundda qebîla wî ya lape mezin bû). Zûtirekê mêrê qebîlê mala Nadoda berev bûn.

- Gelfî lawika, min îro bona pîrsekê gazî we kirye, dixwezim we bişêwirim.

- Keremke, kek Nado, - çend hazira gotin.

- Çawa hûn îdî pêhesyane, navê kurê Emo pey qancixa qîza min ketye. Eva çend mehe gundda derheqa wê yekêda qenc-xirab xeber didin. Ez tiştêkî navêjim, Kerem xortekî başe. Lê ji mala Emo qe deng-his tunene. Hûn nha minra bêjin – ha jî nabe, ne? Mera şerme, wekî navê qîza me usa derketye. Em şerma xwe nikarin herin nava gund. Hinekê xêrnexwaz te'na me dixin, xebera ber mera davêjin. Bira, ha nabe, eva pîrsa gerekê bê safîkirinê. Qîz û xortin, hev hizkirine. Ê, bira mala Emo bi erf-edetê dinê bê, bixwezin. Lê ew wê yekê nakin. Em nikarin evê eybê daqurtînin. Serî-binî maleke, lê me bendî tiştêkî hesab nakin, dixwezin ya xwe bikin. Ha jî nabe. Hûn minra çi dibêjin?

- Keko, emê tera çi bêjin? Çawa tê kivşê, tu rastî, mala Emo me bendî tiştêkî hesab nake. Lema jî radibin nav-namûsa mera dilîzin. Ya minbe, emê hişê wana bînin sêrî, - ji hazira Qero got.

- Usa nabe, - yekî navsere got. – Wekî naên naxwazin, bira keç'ik here, serda rûnê. Xwe heta-hetayê em nikarin vê yekê temûlkin. Lê dha rind dibe, çawa

min got, bira keç'ik here serda rûnê. Wekî ew yek nebû, wî çaxî pira-pir, hindika-hindik.

Çend merîê mayîn jî xeberdan, lê gişk hatine ser wê fikrê, wekî rind dibe bê şer-dew ew pirs bê safîkirinê. Lê safîkirina wê jî ewe, wekî Fîlê here ser Keremda rûnê.

Gişka ya xwe kirine yek, wekî sibê Fîlê boxçê kincê xwe hilde here mala Emo ser Keremda rûnê.

... Mala Emoda erf-edet gelekî berk bûn. Kura şerm fikir ber bavê navê jinê xwe hildin, nêzîkî zarê xwe bibin. Wexta yekî zara xwe dida hemêza xwe, bav ku derda bihata, pêra-pêra zaro datanî, jê dûr diket. Wexta nanxwarinê hersê kura û bavê tevayî nan dixwarin. Helê tenê, lê bûka tevayî nan dixwarin.

Carekê, wexta mêra nan dixwar, Helê çûbû wêderê sekinîbû û wan nihêrîbû. Emo hildabû gotibûyê:

- Çiye, tu hatî parîê me hesab dikî?

Pey wêderêda, wexta mêra xênîda nan dixwar, tu cara ne Helê, ne jî bûk nediçûne wêderê.

Gotina Emo malda zakon bû. Ewî bigota “reş spîye”, gişk gerekê jêra qayîl bûna. Ewî hiznedikir, gava yek ber gilê wîda dihat, ya nemayî danî sêrî. Lema jî jin, kur, bûk jê ditirsyan û nikaribûn ji gilê wî derketana. Emo çiqas xeysê xweva berk bû, ewqasî dilê xweda rem bû. Neferê malê ev yek zanibûn û tu wexta jê nedixeyîdîn, çiqasî jî Emo wanra sert xeberda. Gişka zanibû, wekî ew rastgoye û tiştê rast dike.

... Nîvro bû. Helê tendûr dada bû, xwarin çêdikir. Herdu bûka – Nazê û Zînê alîê wê dikirin.

Zivistan bû, xebata derva tunebû, heywanê xwe alif kiribûn, lema jî Emo û hersê kur odêda rûniştibûn û qse dikirin.

Nişkêva Fîlê boxçe dêstda hate xênî, boxçe danî û stûna nêzîkî tendûrê bi herdu desta hemêz kir.

- Pî, lao, ev çi hal-hewale? – Helê jê pirsî.

Fîlê caba wê neda û serê xwe berjêrkir. Helê zanibû edetekî ha nava kurdê êzdîda heye: wexta qîz vî cûreyî dike, dêmek ew hatye ser xortê malêda rûniştaye.

Helê ecêbmayî mabû, bûka xebata xwe hîştibûn, zûr bûbûn Fîlê dinihêrîn û nizanibûn çi bikrana.

- Lao, Kerem haj te heye, wekî tu vê yekê dikî? – Helê jê pirsî.

Fîlê neyseyî serê xwe hejand giva haj pê heye.

- De wekî usane, ezê herim malxue malê û lawikara bêjim, - Helê got û derket çû odê.

- Lo-lo, - Helê berbirî Emo bû, - Fîla qîza Nado boxçê xwe hildaye, hatye, stûna ber tendûrê hemêz kirye.

Emo jî zanibû, eva yeka çi nîşan dide.

- Te jê nepirsî Kerem haj pê heye yanê na?

- Erê, lê çawa, min jê pirsî. Belengazê minra xeber neda, serê xwe hejand, wekî erê, haj pê heye.

- De wekî usane, kuro, ravin, em herin ez xwexwa jê bipirsim, - Emo gote kura, û gişt çûne xênî.

Emo ber Fîlê sekinî û jê pirsî:

- Lao, tu hatî ser Keremda rûniştî?

Fîlê serê xwe berjêr kir û ber xeber neda. Emo cara dua pirsî. Fîlê her tenê serê xwe hejand.

- Kuro, lao, em herin odê, - Emo got, da pêşya kura û çûne odê. – Hela rûnên, em kuma daynin pirsî jê bikin. Kerem, lao, hergê gur-gumanê te digihîjê, qîze, hatye, em qebûlkin. Tu tenê minra rast bêje – erê yanê na?

Kerem şermoke bû. Wê çawa îzn bida xwe ber bavê û bira bigota erê. Kerem xwe kerkir. Bavê cara dua îdî bi hêrs jê pirsî.

- Te çira xwe kerkirye, dengê xwe nakî? Bêje, tu haj pê heyî yanê na!

Kerem xeysê bavê zanibû – hetanî bav caba xwe nestîne, dest ji wî bernade.

- Na, bavo, ez haj pê tuneme, - Kerem serê xwe kire ber xwe û hêdî got.

- Tu minra rast bêje – haj pê heyî yanê na! – Emo dha bi hêrs wekiland.

- Na, bavo, gur-gumanê min nagihîjê.

- De wekî usane, em maleke tenêne, ew jî qebîleke mezinin, dixwezin zorkuşîfê me bikin, - Emo got û derket çû xênî, destê Fîlê girt, ji stûnê dûrxist, boxçê wê da dêst, ji malê derxist.

Fîlê por û poşman bi girî vegerya malê.

Nado ne li mal bû. Jinê zerek şande pey û Nado pêra-pêra vegerya malê. Gava pêhesya çi bûye, cina ket, xênîda çû, hat û hey dida ç'êra. Çend cara nêzîkî qîzê bû, ku qûre-qûra wê bû digirya, çend tep dane nava ç'eva.

- Lo-lo, ha nave, - jinê bi girî gotê, - gerekê tiştê bikî! Yan na em bûne oyîn-sosret! Ewî namûsa mera lîstye, navê qîza me derxistye!..

- Lê ez xwe vê rûreşî usa nahêlim! Ez zanim ezê çi bînim serê wê malê! Tu bisene, tê bivînî... De zû bike, gede bişîne pey lawikê me, bira zû bîn!

Emo zanibû, wekî Nado û qebîla wî vê rûreşî usa nahêlin, wê ese tiştê bikin. Lema jî kurara got, wekî rind tivdîra xwe bivînin. Çar qemê malê hebûn. Gote kura, wekî wexta Nado û merivê wî bêne ser wan şêr, bira her yek qemekê hilde. Ê gote wan, wekî wê qema dirêje ber ewê bigre xwe.

- Zanibin, dijminê bê derê we bigre, - Emo gote kura. – Gotî her yek we dewsa çend mêra şerkin, çimkî ew gelek in. Ezê piş we bisekinim, kê paşda vekîşya, ezê qemê bidim nava ç'evê wî.

- Çiye, bavo, tu naxwazî tevî şêr bî, tê alîkî bisekinî? – Salih gotê.

- Na, lao, bavê we nemirye we tenê bihêle. Gotina min tenê ewe, wekî ber dijmin hûn paşda venekişin. Bira ser wî guhî ranezên, wekî em maleke tenêne û dikarin hêsa xwera navekî qazanckin. Na, dijminê îro derê me bigre, û em gerekê nav û mêranya xwe xweykin. Çi dive bira bive, çawa dibêjin, pira-pir, hindika-hindik! Lê min hûn mezinkirine bona çi rojê?

- Ê, bavo, dikare biqewime ew neên ser me şêr, - Seydo gote bavê.

- Na, lao, me rûreşîke usa anya rûê wan, wekî ew nikarin wê yekê daqurtînin. Yan na, wê nava gund û êlêda bivne sosret. Lema jî em gotî rind haj xwe hebin. Îro nîbe, wê sibêbe.

... Lawikê qebîla Nado hatin, oda wîda berev bûn.

- Keko, çi bûye, çi qewimye? – gava rûniştin, yekî ji Nado pirsî.

- Wê çi bibe, vê rûreşîê zêdetir wê çi bibe? – Nado bi cûrê pirsê caba wî da.

- Çawa rûruşî? – Qero pirsî.

- Erê, rûreşî, rûreşî, - Nado gotê û destê xwe çoka xwe xist. – Evê qancixa qîza min îro boxçê kincê xwe hildaye, çûye ser kurê Emoda rûniştaye. Emo û kurava ew qebûl nekirine, berî danê ji malê derxistine. Ev ne rûreşîye?

- Erê welle... Ew ne tenê rûreşya teye, lê ya temamyê qebîla meye, - Qero bi hêrs got. – Hela tu min vê mala tek-tenê binihêre! Usa xwe gumanin, tê bêjî xweyî-xudanê gundin.

- Na, keko can, desûtra te hebe, em gerekê heyfa xwe hildin. Bira ew zanibin, wekî dew birê maste, bira destê xwe nekin her qula. Qul hene mişkin, qul hene me'rin.

- Erê, lawik rast dibêjin, - yekî navsere got. – Wekî em vê rûreşîê ha bihêlin, wî çaxî em gotî laç'ikê jinê xwe bidne serê xwe û ji mala xwe derneên. De ravin, herin, tivdîra xwe bivînin, çawa lazime bela wana bidnê, bira bêne ser hişê xwe. Bira zanibin şuxulê wan tevî kê heye!

Çend merya jî xeberdan, gişk ser wê fikrê bûn gotî hema îro jî herin êrîşî ser mala Emo bikin.

Xêlê wext şûnda çend mêrê wê qebîlê pê qema, lê Qero pê arkolkê tendûrê hev girtin, dane ç'êra û berbi mala Emo çûn.

Emo û kurava berê berfa ketî wêda avîtibûn, ber dêrî heyat vekiribûn, berfa avîti bejneke bilind bûbû.

Nado û lawikê wan hatine ber derê Emo, hilkişyane ser berfa avîti û mala Emora dane ç'êra. Emo hersê kurava dane qema derketin heyatê. Emo piş kurava sekinî bû. Destbi şêr bû. Bû şeçe-şeça qema. Qero bi arkolkê tendûrê xwest serê Keremxe. Kerem bi qemê xwe xweykir û qemê zerp destê Qero ket. Arkolkê destê Qero dêst ket û çar tilê wî hatine birînê, ketne ser berfê û pirpitîn. Hetanî wî çaxî

gundî îdî hatibûn gihîştibûn wan, ketne ortê, ew ji hev dûrxistin. Lawikê qebîla Nado dev dan birin malê wan.

Emo û kurava vegeryane malê.

Çendekî şûnda hukümet pêhesya, hatin Kerem girtin, birin. Zûtirekê dada wî kirin, şeş meh gune danê.

Mêrê gunde navûdeng navçîgarî kirin, wekî mala Emo û Nado hevdu bîn. Çar tilê Qero hatibûne birînê, û Nado dewa xûnê kir. Edet bû, wekî heqê xûnê bidin. Emo qayîl bû. Lê çimkî zêrê wî tunebûn, ewî ax'levê pezê xwe bire bazara gundê ermenyaye jêrîn, firot, da serê rê, vegerya hate gund.

Gava nava gundra derbaz bû, Nado ser xanîê xwe dûrva bi tirkî jêra da ç'êra:

- Min maka te ha-ha kiro, k'a be'be'?

Emo bi tirkî caba wî da:

- Ez maka te ha-ha bikim, îro be'be' tunene, wê sibê hebin. Lê tilê qop tê ku bînî?

Çend roja şûnda Emo bi zêra heqê xûna tilê Qero da.

Mala Emo û qebîla Nado rûva hevdu hatin. Lê qebîla Nado ew rûreşî û tilê qop bîrnekirin, kîn dilê xweda xweykirin.

Çimkî pezê mala Emo îdî tunebûn, lema jî Salih û Seydo çûne gundê ermenya rênçberî kirin, wekî pera qazanckin û bîn xwera pêz bistînin.

Payîza dereng Kerem ji girtinê azabû, hat, xwest alî bira bike. Zûtirekê Kerem çû Tilvîsê bixebite. Çend lawikê qebîla Nado, ku wêderê paletî dikirin, rûva Keremra baş bûn, giva hertişt bîrkirine, jêra hevaltî dikirin. Kerem jî dilê xweyî sax' bû, ji wana bawer dikir, hevsa xwe ji wana nedikir û wanra hevaltî dikir. Rojekê jî gava ewana tevayî çûn nan bixun, dizîkava je'r kirine nava xwarina Kerem. Ew je'reke usa bû, wekî pêra-pêra hukümet nedikir, hêdî-hêdî nexweşî zêde dikir.

Kerem nexweş ket. Çend roja Tilvîsêda ma, wî tirê wê zûtirekê qencbe. Lê çiqas çû nexweşî hê giran bû, û Kerem vegerya gund û kete nava nivîna. Îdî ji nava nivîna derneket... Cahil-cahil, nezewicî çû rehmetê.